Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(63)	Tebax	2005 z~2617k	Buha (15) p.s

Kî dixwaze…?!

Kî bixwaze bixwîne, binêre, bibîne û têbigihe, dê zanibe ku, çendî bi serê kurdan bi gelemperî hatiye lîstin û xelkê me hatiye xapandin…vêca çi bi navê misilmantî û terîqetê, çi jî di bin perda rûmeta Eşîrtî û netewayetiyê, bi ser de jî durişmên şoreşgêrî, sînor û tixûbên Kurdistan û kurdayetiyê.

Dîroka gelan baş daye nasîn ku, ne pêla hest û xweziyan li ba kesan, ne jî dilhezî û hêviyên gerim li ba gelan dikarin rastiyên mezin ji holê bidine alî û bincil bikin, an jî serkeftin û guhartinên hêja pêk bînin.

Hatiye zanîn ku, dîtin û naskirina rastiyan wek ku henin, bona çareserkirina pirsan, gava yekemîn ya herî girîng û pêwîst e. Lewre jî kar û xebatên di warê lêkolîn û lêgerînan de, nemaze yên zanistî û serbixwe, her û her pêdiviyên sereke û bingehîne, û di pê re, xêz û movikên piroje û bernameyan têne berhev, da ku dûv re, siyaset bigere û bête.

Rêxistin û partiyên siyasî yên ku dixwazin bi dilsozî bixebitin, her dê meraq bikin ku bibine xwediyê bernameyeke zelal û bi kêrhatî, da ku karibin cî bigrin, di ber wê bernamê de bixebitin û li hember dadgehan lê xwedî derkevin, dûrî durûtî, keysebazî û sernizmiyê bin.

Bernama siyasî ya parta yekîtî ya demokrat ya kurd li Sûriyê ya ku kongira 5-an li Buharа 2005-an li ser erêkirî û weke dokument-belge-di malpera yek- dem.com (Newroz) **D.R.(11)**

Bîranîna Qsimlo

Mafên mirofan û dadmendî ji tevan re , di bin siya cîhaneke aştiyane de, ev nama me ya sala 1990 î ye. P.D.K

Di 22ê Tebaxa 1930î de, li Ormiya – Kurdistana Îranê – E. Qasimlo ji dayîk dibe.

Dema Îran ji, hêla hêzên Hevbend ve, di sala 1941 an de, tê dagîr kirin Pir guhartin peyda dibin. Kurd wek netew jî, hestê netewî li cem wan bilind dibe. Lewre jî, di sala 1945 an de, ji hêla nemir **Qazî Mihemed** û hin Kurdperweran ve, P. D. K Îran tê **D.R.(10)**